Di vê lêkolînê de yê ku alî min kirin di serî da ji Kurdên Deşta Herranê, Abdullah Güneş, Azad Demir, Eyüp Kuran, Hamit Kılıçaslan, Hamit Yıldırım, Hatip Özer, İskan Teğin, Keya Müştak, Medeni Akgül, Medeni Avcı, Mehmet Emin Kardeş, Mehmet Özdemir, Mehmet Sarısaltık, Mehmet Sıraç Bilgin, Mehmet Sıraç Yeşil, Mehmet Teker, Mert Nedim Alhas, Metin Dinar, Müslüm Ölmez, Sadettin Aydın, Sait Aydoğmuş, Servet Yazar, Sıtkı Zilan, Şaban Bilgin, û xanima min Bedriye Semra, xwesiya min Koçer Savaş, kurê min Serok, keçên min Evin, Dijle, Şirin û Dilber û kesên ku keda wan têde heye ji hemûyan ra spasiya xwe pêşkêş dikim.

W.K.Merdîmin, Mehemed Malmisanîj, Roşan Lezgin, Deniz Gündüz û Reşo Zilan, di lêkolîn, xebat û rast nivîsandina zaravên kirdî û kurmançî da alikariya min kirin.

Derheqê navên rehekan bi kirdî de ji nivîsên berhevokî yê rihmetî Necmedin Büyükkaya (Nameyê Tay Çiyan / Bazî Şeylerin Adları), Nafiz Yılmaz û Siyamend Mirvanî û berhevokên ligel malpera internetê ya Doğan Munzuroğlu istifade kir. Necmettin Büyükkaya ji devera Sêwregê, Nafiz Yılmaz ji Gêlê, Siyamend Mirvanî ji Mîyaranê û Doğan Munzuroğlu ji Pûlurê navên rehekan berhevokirine.

Min ferhengên Kurdî yê giştî, pirtûk, kovar û berhemên ku hetanî nuha hatine weşan raçav kirin. Bêyî viya Erdnigariya ku Kurdî lê tê axaftin da li rojhilat ji Îdir, Bazid, Wan, Colemergê, li rojava ji Mezra Zazalera Zara yê, ji Bakur de ji Mamaxatûn û Gogsi yê, li başûr ji Barzan, Amêdî, Dihok, Mêrdîn, Riha, Semsûr û hettanî Merezê rehek li havîrdora xwe hatin ditin û navên wan hatin berhevokirin. Kurdên Merezê pêşyê navê rehekan ji min ra gotin, wexta ku min navê wan bi Kurdî nivîsand, êdî ji min ra negotin.

Ez di vê xebatê xwe de deverên Tirkîyayê ku Kurdî tên axaftin li Bazidê Agirîyê; Motkiya Bidlîsê; Navenda Colemêrgê; Azarpêrt, Darahênê, Kanîreş, Bongilan û Navenda Çewlîgê; Çermûg, Çinar, Şankûş, Piran, Gêl, Hêne, Pasûr, Licê Silivan û Navenda Diyarbekirê; Mamaxatûna Ezirganê; Gîngîma Mûşê; Kangal û Zaraya Sêwazê; Qisla, Pûlur, Pîlemuriye û Mamekiye ya Dêrsimê; Sêwrege, Sirûc û Navenda Rihayê; Kolik û Navenda Semsûrê; Nîsêbîn, Qoser û Navenda Mêrdînê; Navenda Îdirê; Navenda Wanê; Maden, Mîyaran, Sivrîce, Palo û Xulamanê Xarpêtê geriyam û min navê rehekan berhev kirin.

Di Ferhenga Navên Rehekan a bi Tirkî, Ferhenga Rehekên Tirkîyê, Rehekên Endemîk û Tibbî yên Devera GAPê, Nadîde Kufîlkên Ruhayê, Hebûnên Xwezayî yê Ruhayê û Listeya Rehekên Tirkîyê da navên Kurdî hatin tesbît kirin û hatin veguhesin bi tîpên Kurdî û tevî xebata xwe kirin.

Di vê Ferhengê da, di Kurdî da çuqas navên herman rehekê hene hatine nivîsandin hatinê peşkes kirin.

Di dawîya bêjeyê de zayenda rehekê bi kurtayî hatiye nivîsandin. Mînak gula sor (m), teliyê beloq (n) v.b.g.

Eger tê zanîn ku jêderk, kes û cihê ku bêje jê hatiye girtin Di pêy kurtaya zayendê ra hatiye kodkirin. Vekirîya van kodan da, beje, naven kes yan jî bajar û deveran di listeya dawiyê da vekirî hatiye diyar kirin. Mînak: IS (Îstanbul Kürt Enstitüsü), CB (Celadet Bedirxan), SHB (Sadulah Husên Bamernî), Dîyar (Diyarbakir), Pali (Palu), Sîwan (Sivan) vbg.

Ji bo agahdarî, di gerên lêkolînê de rêbazên li jêr hatine xebatandin:

a. Berêberê çavkaniyên Kurdî hatin raçavkirin da ku deverên ku ezê biçimê listeya rehekan hat amade kirin, û di gerê de rehek gorayê navên vê listeyê hatin lêgerîn.

b. Di dema gerên lêkolînê da gellek navên Kurdî yê rehekan ji xelkê hatiye seh kirin. Di derheqê navên rehekan da zanibûna van kesan kêr bû, loma min bi çavkaniyên din kontrol û sererast kirin.

c. Rehekên navên wan bi Kurdî hatin sehkirin, numûne wan hatin girtin û li Unîversîteya Dicleyê li cem Prof. Dr. Selçuk Ertekin û Prof. Dr. Ömer Saya bi navê Latîni û Tirkî hatin teşhis kirin. Di diyarkirina navên kuvaran da jî Ji Prof. Dr. Abdunnasir Yıldız destek hat girtin. Ji Unîversîteyê Dicleyê Prof. Dr. Abuzer Sağır, li seriyê vî xebatê de, ji Unîversîteyê Heranê Hasan Akan jî beriya weşandinê vî ferhengê, bi pêşniyazên xwe piştgirî dane min. Sipasiya wan dikim.

d. Li hember navên rehekan ên bi kurdî û bi tirkî yên latîni, di pirtûkên Flora of Turkey, Flora of Iraq û ya nuh hatiye weşan Listeya Rehekên Tirkîyê (Türkiye Bitkileri Listesi) de hatine pejirandin, hatin dayîn.

e. Navên taksonan bi Kurdî bi navên taybetî hatibin terîfkirin jî, nivîsandina wan bi tîpên biçûk tîn nivîsandin. Mînak; adirvîla koyê bingolî, qewaxa firatî, vîla anafatma.

f. Li deverên ku Kurdî tê axaftin rehekên li wirana geş dibin û bi navên ku li bazara tîn frotin jî lê hatin zede kirin.

g. Di Ferhenga Navên rehekan da wêne nînin. Ger xwendevan bixwazin dikarin bi navên rehekan yê latîni têkevin motora Google û bi sedan wêneyan bibînin.

Di rêk û pêk kirina navên rehekan bi kirdî / zazakî, xebatên Grûba Xebata Vate'yê; navên rehekan bi kurmancî jî, ji Grûba Kurmancî'yê bingeh hatiye girtin.

Ji bo navên rehekan ji Tirkî veguhestina Latîni û ya ji Latîni veguhestina Tirkî, ji internetê bi riya motora Googlê hatiye îstifade kirin.

Binavkirina Rehekan

Navdanîna navên rehek û grûbên rehekan bi hêsani û watedar hatiye bi karanîn.

Bi latîni navdanîna rehekan

Navên rehekan ê zanistî ya rasterast ji latîni, yan jî ji zimanên din tîn wergirtin û tê veguhestin bi rêbaza zimanê latîniya Grekîkirî. Navdanîna cûreyên rehekan ji du bêjeyên bi latîni hatiye tertip kirin ku Dumend "Bînomînal navkirin" tê gotin.

Mînakên bikaranîna navên bînomînal

Morus / dut / tu

Morus alba / beyaz dut / tuya sipî

Morus nigra / karadut / tuya siya

Morus rubra / mor dut / tuya ximrî

Di navên latîni da bikaranînen derbarê Kurdan

Ku navên latîni bi Kurda ve grêdayî be, bersiva navê Latîni bi Kurdî hatiye girtin nav navên rehekan.

<i>carduchorum</i>	Ê kurdan
karduchorum	Ê kurdan
<i>kurdicus, a, um</i>	Kurd
kurdiciforme	Forma kurdicum
<i>kurdistanicus, a, um</i>	Kurdistan
<i>Amygdalus carduchorum</i>	behîva kurdan, vama kurdan
<i>Alcea kurdica</i>	hêroya kurdan, hîroya kurde
<i>Taraxacum kurdiciforme</i>	giyakewê kurdan
<i>Paeonia mascula ssp. kurdistanica</i>	gulhirça kurdistan, heşvîla kurdistan
<i>Allium kharputense</i>	pîvazê xarpêtê, pîvazê xarpêti
<i>Origanum munzurense</i>	anîxa mizurî
<i>Populus euphratica</i>	hewlêra firatî
<i>Ranunculus bingoldaghensis</i>	adirvîla koyê bîngolî, çûnga çiyayê bîngolê

Navên zanistî yên bi latîni yên cureyên rehekan ku bi Kurdan ve eleqeder be, li hember navên Latîni di Îngilîzî û Fransîzî carna bi termên Kurdish û Kurdistan hatine binavkirin.

Mînak; reheka navê wê yê botanîkî *Phlomis kurdica* ye, bi Îngilîzî navê kurdish sage, bi Fransîzî navê *Phlomis du kurdistan*, bi Tirkî navê munzur çalbasî hatiye binavkirin ku Kurd jî dikarin bi navê “guhbeloka kurdan”, yan jî bi navê “sivanoka kurdistanê” binavbikin.

Reheka bi navê *Orobancha kurdica*, Îngilîz bi navê kurdish broomrape, Fransîz orobanche du kurdistan, Tirk jî bi navê şark baklakoranî binavdikin ku, Kurd jî dikarin bi navê “agirokê kurdistan”, yan jî “mergvaşê kurdan” binavbikin.

Di Berhema bi navê *Listeya Rehekên Tirkîyê* de ku di dawiya sala 2012an de bijare botanîkçiyên bijare yên Tirkîyê bi hevra amadekirine; *Symphytum kurdicum*-bi navê kûrt kafesotu, *Onobrychis kurdica*- bi navê “kûrt korungasî”, *Salvia kurdica*- bi navê “kûrt şalbasî”, *Picris strigosa ssp. kurdica*-bi navê “kûrt şirosu” hatiye navlêkirin.

Bi Kurdî Navdanîna Navên Rehekan

Pêşiyên me bi hezar salane ku nav li rehekan kirine û ev navana hetanî dema me anîne. Lê mixabîna beyî berhemên ku di derheqê rehekên tîbbî de hatiye nivîsandin, tenê di ferhengên giştî de em li malûmatên derheqê rehekan rast tên.

Wexta navdanîna rehekan, bi kar anîna wan(xwarin, derman, jahr, boyax, xeml), şûfa wan(reng û şikl), bêhna wan, tahma wan, cîhê ku lê hêşin anîne ber çavan. Bandora navên ajalan jî li ser navlêdanîna rehekan heye.

Mînakên bi karanîna navên famîliyan

Di nav xelkê da, bikar anîna navên famîliyayên rehekan da navên Kurdî yê li jêr hatine tesbît kirin.

Colchicaceae – acıçığdemgiller - sosinine

Gramineae – buğdaygiller - genimî / xeleyî

Leguminoceae - baklagiller – baqleyî

Polygonaceae – madımakgiller - sinbêlreşên

Mînakên Navên Cinsan

***Euphorbia* (Sütlegên)**

delek, deley, delêk, delê şiti, deliyek, dêlek, diley, diliye, dolik, giyaşîrk, guloşîrk, helezê şîrdan, îrkitik, kujîlk, miravke şitê delek, şîranok, şîremar, şîrê deveyan, şîrik, şîrkutik, şîrmar, şîrxujîlk, taliya mar, talşîrk, toliye, vaşo şitin, vaşê şiti, vaşo bêar, xagşîr, xagşîr, xaşîl, xenetûrk, xişul, xoşil, xujîlk, xujyak, xulişîrk, xurşîl, xwaşîl, xweşîl, xweşîng, delek, deley, delêk, delê şiti, deliyek, dêlek, diley, diliye, dolik, giyaşîrk, guloşîrk, helezê şîrdan, îrkitik, kujîlk, miravke şitê delek, şîranok, şîremar, şîrê deveyan, şîrik, şîrkutik, şîrmar, şîrxujîlk, taliya mar, talşîrk, toliye, vaşo şitin, vaşê şiti, vaşo bêar, xagşîr, xagşîr, xaşîl, xenetûrk, xişul, xoşil, xujîlk, xujyak, xulişîrk, xurşîl, xwaşîl, xweşîl, xweşîng

***Urtica* (Isırganotu)**

adirvaş, axîç, derxîçik, dêrzînik, durzik, durzile, gezek, gezende, gezgezîk, gezgezîng, gezgezîk, gezgezok, gezîk, gezînik, gezînk, genze, gezok, geznîk, giyaagîrk, giyadûpişk, giyagezîk, giyagezîk, heşek, hêşeg, îrxîçi, kefpîzîk, kevgez, quzgezîk, yexîj

Mînakên navên cureyan

baqla gayan, baqla heran, baqla maran, baqla pîsîngan, baqla sultanî, baqla şalan, baqla xatûnan, baqla xelan, baqla zaracan

gurnîga çolan, gurnîga deveyan, gurnîga gamêşî, gurnîgê erdî, gurnîgê heran, gurnîgê hêgayan, gurnîgê kurîsî, gurnîgê kutikan, gurnîgê medreban, gurnîgê mêşnan

Guherîna tîpan

a – û	anix - ûnix, vam – vûm, teliyê heran – teliyê herûn
a – o – û	mamix - momix – mûmix, qizwan – qizwon - qizwûn
b – v – w	bizî-vizêr-wizim, qizban – qizvan – qizwan ribês – rivês – riwêş, şablêre - şavlêre - şawlêre
b – p – v	dinêb – dinêp - dinêv
c – j – z	pêcek – pêjek - pêzek
d – t	xerdel - xertel
e – i	selme - selmî, melje - meljî, merje - merjî
e – o	cew – cow, adirek, adirok, hewrs-howrs
f – w	binefş – binevş - hînevş, kerefs – kerevz - kerewz
g – k	guhbizîng – guhbizînk, gurnîg – gurnîk, pelg / pelk
h – w	ceh-cew, hors - wers

h – y	hêluge – yêluge
k – q	bakla – baqla, dilqok – dilqoq, şekok – şeçoq
l – r	dimol – dimor, gilgil – girgil, encil – encir, incil – incir, melje – merje şelwarbekol – şerwalbekol
s – ş	ribes – riweş, sîr – şîr, vas – vaş
s – z	gilyas – gilyaz, giyağêsk – giyağêzk, gîlas – gîlaz, gîsbelok – gîzbelok
w – y	teliwo siya – teliyo siya, teluwek, teluyek

Ketina dengdêr û dengdaran

b	pembe / pembi / pembo / peme / pemi
d	bendik – benik, vindêre – vinêre, gîndgil – gîngil
he / h	halekok / alekok, helerge – lerge / lerg, hengure – engure / engur, hesparike – esparike / esparik, hemroke – emroke
i / iw	gîwîz – gîz
î / iy	vîyalêre / vilayêre / valêre
y	reyhan – rehan, rêyhan – rêhan, riyhan – riban
w	hewrs – wers, howrs – hors

Navên Gorayê Hebûnê

Navên Yekhejmar

araqe, beng, cax, dal, gezi, gom, merje, mircor, parik, silvaş, so, sûs, weşare, xas

Navên Pirhejmar

baqla xatûnan, bîya qufikan, celhteliyê bêyaban, dara koçikan, engurê maran, gula qehpikan, nanê mîrçikan, runînê goligan, toqayê keynayan, vaşê tizbeyan

NAVÊN GORAYÊ BÎNESAZIYÊ

Navên Xweser

anix, behîv, bey / beyok, ceh / cew / cow / yew, çuxlet, genim, gewen / gunî, gez, hîro, kengcr / kereng, punc, sîr, siping / şing, tey / tuhok, vam, xox, xele, zul

Navên Hevedudanî

adirvil, argudvaş, berxûlvaş, çimbeloq, dîkpenc, dîkmarî, gatu, gulzirna, herteli, nançûg / nançîvik, pencexanim, pelpihûn, valbor, xozmêwe

Bi dubarekirina navan ve navên hevedudanî

alal, bizêbizê, çakçak, çarçar, filfil, kewkew, kirkir, kofkof, mişmiş, nehneh, parpar, naznaz, tirtir, xaşxaş

Di navên hevedudanîde cî guhestina navan

bîşeng – şengebî, darkoçik – koçikdar, gademe – dimêga, gother – hergot, merteli – telmeri, qizwan – qiznaw, vaşreng / rengvaş

Navdêrên Çêbûyî

Bi mînakên navdêrên çêbûyî,

Navên bi pêşgiri çêbûyî,

a-	agul (Latince adlandırma da "a" önekiyle adlandırma vardır, Türkçe'de "süz", Kürtçe'de "bê" ile eş anlamlı kullanılır)
bi-	çeperê bidirî, çeperê bistirî, fistiqa bierdki, lobîya bidasî, nefela binêrik
bê-	fasulîya bêdasî, gencê bêqam, gorcala bêtelî, gula bêmrada, gula bêçember, gula bêmiraz, vaşo bêar, vaşo bêkok, vila bêkok, xurêla bêstirî .
şa-	şabane, şabalî, şabaqil, şabelû, şabî / şawîrol, şadirik, şagul, şatere, şatu
pin-	pingilor, pingewen
tir-	tirfiş, tirgewen, tirtir, tirvaş
bi-	fasulîya bidasîye, lobîya bidasî
zîr-	zirbaqle, zirleylanq, zirfistiş, zirgoz / zirguz / zirgûz, zirhewr, zirsosin, zirtolik

navên bi paşgiri çêbûyî,

-bend	alabend, darwend, nêrbend, vilwend, zîlbend
-dank	kevçîdank,
- ek / eke / k	engurmerek, kelawek, paduseke, mastêrk, sayek, veyweke
- ik	ajik, derzînik, gezik, nermik, sûrpencik, şirtik, tastasik, tirşik
- in, îin	gezîyo boyin, mîsmîseka zurayîn, naneyo pirçîn, newrozîn, pilxin, tellîyîn, runîn,
- inc	salinc, sarinc, sûrinc, teyinc, vilinc
- î	gizêrî, nîsanî, şimşêrî
- ok	agirok, çinarok, destarok, hengimînok, kemerok, mertalok, silqok, sîrmok, tirşok
- one / onek	bawkone, dakone, darone, mijmijonek

Bi dubarekirinê çêkirina navan

-an	halhalan
- k	gezgezîk, reşreşîk,
- ek / eke	cehcehek, çalçalek, hanhaneke
- ik	hedhedik, hufhufîk, reşreşîk, sorsorik, toptopik, vizvizik, xaşxaşîk, xumxumîk
- ok / oke	bîzbîzok, helhelok, keşkefok, mijmijok, naznazok, rezrezok, şeşşeşok, xamxamoke

Bi pêvekên navberê çêkirina navan

cilegone
gula rengawreng
kuya milederge
lingê lengûlengî

Navên pareng (Ortaç adlar -Sıfat filler)

astorkay / astorkey, birakuj, biroq, dargerînk, fetisok, fijdimêre, gaperçok, gaxuniq, gezek / gezgezik / geznik / gezok, gilgilo teqiyaye, gorcala arrakewte, gurxenêq, herxeneq / herxeneq / kerxeneq, kerxeniq, şekoka xeniqoke, şinga çiqiryaye / şinga tadaye, vîyala dardekerde, xeniqok

Navên Terkîbî (Qedîneyî)

Nav terkîbkirin

baqla xatûnan, baqilê keran, engurê maran, kewza awî, nequrê leglegî, neynûka bûkê, simbila mezopotamya, sosina awê, sungê kilkor, şitlên xezalan, vila kutikan

Hevalnav terkîbkirin

baqla tahle, kekvila zerde, kengero şîrik, kundirên mîranî, nehaya bejî, piranê varekan, telîyo topik, vaşê xembolikî, vaşo nerm, vilika qatqatan, zerdelê hûr, xoşîla rastiqên

Bi navên rêzkirî çêkirinan navan

adirvila koyê bîngolî, gezê fekê çemî, kevza heneya cindan, sirê koyê dêrsimî

Bi Rengdêran Binavkirin

Bi rengan

bengzerik, bengo zerde, colika kumsorik, çarpelik, çavzerk, gariso sipî, gewrikvaş, gezo sûrin, gilgilo sipî, giyagewrik, giyareng, gula zere, hebsîya, hebreşk, hezarreng, kefzer, kekvila sipîye, kekvila zerde, kevza reş, kizina reşik, kizina sorik, koksor/koksûre, koreko xaşik, mamûşaga belek, nefela menûşe, nîlufere sipîye, qerbelek, qerqaşa wisare, rengvaş, sersipîka kurde, simbila eflatûne, sosina gelekeng, sûrpencik, sûrvaş, sîyateli, sûrval, sûrkelem / kelema sor, tirşika rengan, tuya ximriye, vama şîne, wîroleçerme, zemeqçermig, zergoz

Bi Hejmaran

binefşa sêreng, dimor / dimol / dimuel, çarteli / çartelu, çarçar / çarçal, çelpere, çilbisk, çilpere, çilxatûn, darcêwîya sêçeqlê, gula hewtrengê, gula sêbelg, gula şêstper, heftreng, heleza sêbelg, helezê pêncbelg, nefela sêbelg, nefela pancpele, gula şêstpere / gula şêstpele, hezarbelg, hezargez, hezarreng, hezartere, pêncperî, pîncengust, sêdinank, sêbelg / sêpelg / sêper / sêwere, sêbisk

Bi Navan Navdanîna Rehekan

Bi Navên ajalan navdanîn

Di navên terkîbî de navên ajalan di formen pirhejmarîye de ne

Baqla gayan, binevşa seg, bukê gur, çimê pisingan, çuxletê heran, derpêkê dik, dilqoka heran, engurê maran, gelzûnê mîrçikan, giyayê marmasiyê, giyayê çûkê, goşê kutikan, hanhaneka vergan, hebîka argoşan, hêştirxwar, kerenga kusî, kozvilika mêşnan, nanê mirîşkan, merzekew, piranê varekan, piyazîy hurç, qelemê hêştîran, rihana maran, sawinê mîrçikan, saya argoşan, soyê malî, şaxê askî, şîlarê puyan, talikê zaracan, tarê varekan, telîyê mozikan, tirîyê mameruvî, tirşika heran, tirşikê gayan, tizbîyê dewarî, vasê kekan, vaşê karan, vaşê koteran, vaşê malkan, vilincî bizan, wiştirxwar, zebata pilingî, zulê kesayan

Di navên hevûdudanî de navên ajalan di formên yekhejamarîye de ne

argoşdar, bîrmîrçik, bûkegur, çimğa, darhulu, deleşit, dêlga, dîkpenç, fisegur, fişeş, gafiş, gilebeş, giyaberaz, goştberxik, guhmişk, gunpîsik, hergot, heşbizik, heşvil, marmase, marşing, merteli, merzekew, mêşgir, saylû, şêrpûg, vergvaş, xozpalax, xozmêwe, zulmar

Bi navên kesan

baqla xatûnan, colika xatûnan, çiçega anafatma, dara brahîm, derziya ademî, elikfatik, eyşokê, fatika reş, fatimedarû, gula mehmedîyan, guleferhad, hakê şewketî, hesenhiseynek, hemzebegî, hiznê ûsiv, kerengê fatmanebîyan, mele osman, meryemxort, meyaro, mîrmehmed, porê fatmayî, stîrîyê îsa, şinga xatûnan, vila anafatmaye, vîyalêra sultanî, xatûne / xatûnek, xatûnik / xatûnok, xanimek, xellok, zeynok / zeynoke

Bi navên netewan

bena romî, biha hîndî, dîkê orisî, giwêza amerîka, gozê hîndî, gujê erebî, hîroya kurde, încasa maltayê, kelema brukselê, kerbeşka îspanî, paçley misrî, pîvoka ereban, singoya îspanî, tîrşinga armeniyûn, xernûkê hîndê, zîlika ereban, zîrey romî

Bi Terman Navdanî

Bi beşên rehekan

çiçeg	çiçega agir, çiçega belghûr, çiçega bersiyê, çiçega sîs, çiçega zerik, çiçekmast
dar	asindar, gendar, guldar, wişkdar, darbelû, darebî, darê şivanan, darmasî, dartizbî
dirke	dirê bizmarî, dirê herî, dirê xanî, dirke kere, dirke pûşîn, dirke perçîn, dirke şine, dirke zî
gorale	gola mîzanî, goraleçerme, goralemêrgê, goralemusayanî, goralegîlyan, gorale zerdî
giya	giyaavî, giyabeng, giyagirmok, giyajehrîn, giyapirç, şîrgiya
gul	gula derewîn, gula hesretê, gula qehpikan, gula tehran, gulasmîne, gulbiza, guleferhad, gulemî kok koka zer, koksor, koksûr, kokşafir, kokvaş, vaşo bêkok, vila bêkoke
kulîlk	kulîlka bayê, kulîlka cotarî, kulîlka hespan, kulîlka xezalan
pel	dara belgtûj, pelemêr, pelg, pelhok, pelk, pelgeloqe, pelhewêz, pelkuy, pelpihûn
pîvaz	pîvaza çolê, pîvazok, pîwaze marane, pîyanzê kesan, pîyazo koyî, pîyaze xûgane, pîyûnz heşûn
stîrî	agîrstîrî, stîrîbeloq, stîrîmişk, stîrîpor, stîrîbirk, stîrîlok, stîrîşûjîn, stîrîzerk
teli	çantele, herteli, merteli / teluyê merreyan, siyateli / teluyo siya, teluyo beloq
vaş	adirvaş, berxulvaş, mîrdvaş, mostikvaş, puncvaş, vasê kekan, vasê leglegî, vaso sitin, vaşdik
vil	adirvil, savil, vila newroze, vilheşik, vilika aromî, wile çermin, wile şêre, wilezerd, zavil

Bi Termên Mitolojîk

arêq pêxemberî, gulalnewroze, gulnewroze, nanê pepugî, newroze, vila newroze / vilika newroze, vilika tawise



Bi termên teolojik

buxurê meryemê, cehnemîye, cenetcehneme, ceyê nebiyan, çengê meryemê, çiçega anafatma, giya şeytanok, gula cenetî, gula qadere, gula qiyametê, gule şêxan, hêjîra firawûn, kevza henevê cindan, kengernebi, kerengê fatmanebîyan, kuya şêxanî, nanê pêyxemberî, qelûna şeytanî, vila anafatma, vila qadere

Bi termên Tibbî

birîndarok, çerebirin / çermebirin, çereyê janî, darmelhem, dermanê kurman, giyabasûr, gula çavêşê / gula çimdêjî, giya behlûk, giyayê balûkê, jarmasî / jehremasî / jehrmsî / zarmaşî, kermevaş, kermevil, marmase, masîjehr / masîjehrk, masîkuştin, melhemêre, melhemvaş, tadar, vaşê birkûn, vaşê derbûn, vaşê kerman, vaşê quxikî, vaşê teneşeyî, vila kerman

Bi termên wesilan

bilikê heşî, boçga, çavbaze / çawbaze, çavdik, çavmasî, çimbeloq, çimdik, çimga, çimê pişingân, çimo şa, çimzerik, dêlga, dêlrovî, didankursik, didanê deveyan, dimê astorî, dimê gayî, dimê luyî, dikpenc, dûga, dûvhesp, gademe / gadûvik, geziyê destan, giyayê pozan, goşê hargoşan, goşê kutikan, goşê qatiran, goşmerre, guhpalas, hakê şewket, kelsim, kerika berxo, kerika heşî, kîrbocî, kîrqazî, kuya milederge, lepehîrç, linga malî, lingê leglegî, lingê qanzî, nequrê leglegî, pencşeşêr, pencexanim, pêcanik, pêgurg, pêkew, pêkotir, pêqijik, tîla bûkê, tîla xanimê, tîliya hirçê, tîlîper, wesilvaş, xirnikvaş, zipling, zivanê gayî

Bi termên şiklan

asteregule, çanteleyo gopikin, destarok, doşega şivanan, giştonek, gulzirna, gurniga gilore, goşarek, goşmerre, kelaweke, kîrbocî, mastêrek, mertalok, pelphûn, pingilor, puncvaş, qultifing, şimşîrî, topekelem, toptopik, vilika zurna, vaşê xincêrî, vila gocagan, weşare, xişoka zirnayî, zengilok

Bi termên çekan

gula fişek, mertalok, qultifing, rim, şimşîrî, şûrgiya, tîrdar, tîrkeman, topiz, vaşê xincêrî, xançere, xançerbarî, xencere, xençerek

Bi termên bêhnê

bêhnxoş, bihna xweş, boweweşê, boxoşke / bonxoşke, boyinvaş / bueyinvaş, dara boyine, fisa citêrî, fisa heşî / fisheş, fisverg, gafiş, gendar, geziyo boyin, giyabêhnxoş, giyagenî, kivarkê genî, merxa boyin, pîvaza genî, sîrfisk, şevbihn, şewboy / şewboye, vaşo boyin, vila boye, vila boyweş, vilika aromîye

Bi termen tahmê

bademtale, bakla tahle, çaqla şîrîn, gewnetale, henarî mêxoş, henarî şîrîn, henarî tîrş, soto guzin, îsola tuj, kengero şîrik, kengero talik, kuya tîrşe, silqa şîrîn, silqê şekerî, şîrintabl, şîrinşîrinok, talik, talîka kewnêr, talikê zaracan, talîjahri, taliye, talîşîrik, tîrşedar, tîrşîk, tîrşîng, tîrşok, turşîke, vama tahle, vama şîrine, zebeşa tehl

Bi termên deman

adar, adarek, adarok, adaroke, gulênisane, gula nîsani, kulindê zivistanê / kundirê zivistani, kulilka gulanê, nîsanoke, qerqasha payîzi, qerqasha wisarî, şevgeş, şevgul / şewgule, şewboye, vila adarc, vila gulane, vila rojî, vila wesarî, xeleyo payîze, xeleyo wisare

Navdanîna navên rehekan ku havirdora(habitat) ew lê hêşin dibin

arguda beje, biyoka dehlê, biya berçem, çaya koyî, dargeza nîlê, fistiqa entabe / fistiqa dêluke / darqizwana kirmanî / darwen kirmanî, giyayê serêkaniyan, gulbizaya mazêran, gulika zozanan, gurnigê medreban, helezê kendalan, incasa maltayê, incila tehran, kevza golê, kevza deryayê, kevza reşahiyê, kulilka kaşan, kulilka nevalan, kulilka seravê, kundirê beravê, neflika koyan, neflika dereyî, puneyê hênîyan, pungê tahtê, qalçîçeka binberfê, qewaxa feratî, simbilê çeman, sîrimê zinaran, spîndara feratê, sungê binerdî, sungê kinkorî, sungê mêrgan, sungê dilbêre, vaşê vayan, vilika kaşan

Navên Rehekan yê hemwate

Aynı bitki türleri farklı yörelerde, farklı Kürtçe adlarla adlandırılmaktadırlar.

Anthemis arvensis (köpek papatyası)

adiroke, atroke, babûne, beyare, elikfatike, cenetcehneme, çayrek, çimoşa, çiçega sis, çiçekmast, gula keran, keçelege, kekevaş, kulilka bayê, kulilka nevalan, kulilkmast, vilika tawise, vizike

Urtica dioica (büyük ısırgan)

adirvaş, derxîçik, derzînik, gezgezîk, heşek, quzgezîk, yexîja maye

Navên Rehekan yê hemdeng

Farklı bitkiler, farklı yörelerde aynı Zazaca adla adlandırılmaktadırlar.

anix / ûnix

Mentha, Pimpinella, Satureja, Thymbra, Thymus, Ziziphora

nanê mîrçikan / nûnê mîrçikûn

Anethum graveolens, Capsella bursa-pastoris, Cotoneaster integerrimus,

Polygonum aviculare, Thlaspi arvense

Navên rehekên bi kurdî ku dişibin bi navên latînî

Acacia - akasiyêre, *Ananas* – ananas, *Narcissus* – nêrgîz , *Phaseolus vulgaris* - fasila

Rheum ribes – ribês

Di latînî û kurdî da, di navên rehekan da zayend

Di latînî da, rewşek zayendê ku di tirkî de nayê ditin heye. Di Latînî da zayenda navan heye. Navên rehekan yan nêr, yan mê, yan jî notr in. Bi giştî her zayend bi pêvekek cûda di qede.

Bi Latînî di navên rehekan da pêvekên zayendî

Nêr	Mê	Notr	Mînak
-us	- a	-um	<i>albus, alba, album</i> (beyaz)

-er	-ra	-rum	<i>niger, nigra, nigrum</i>	(siyah)
-is	-is	-e	<i>brevis, brevis, breve</i>	(kusa)
-r	-ris	-re	<i>acer, acris, acre</i>	(acı)

Bi kurdî di navên rehekan da zayend

Di kurdî de zaravayên soranî û goranî de navên rehekan notr in. Lê di zaravayên kurmancî û kirdî / zazakî de navên rehekan yan nêr yan jî mê ne. Rewşa mê û nêr bûyinê bi paşgiran tén nimandin.

Di zaravayê kurmancî de, paşgira mê “-a” û paşgira nêr jî “-ê” ye. Di zaravayê kirdî de paşgiranê mê “-a” û “-e”, paşgiranê nêr jî “-ê” û “-o” ne.

Navê daran mê ne.

Bi giştî navên hejikan mê ye, lê hejikên bi dirrî nêr in.

Navên kulîlkan mê ne.

Navên mêweyan mê ne.

Navên sewzeyan pîranî mê ye, ên ku dişibin organa nêrtiyê, nêr in.

Navên kevzan mê ne.

Navê rehekên bi bahçecik / baqleyî mê ne..

Navên rehekên bi genimok / genimî nêr in.

Navên kuvarkan de sung û arînc nêr in, ên din mê ne.

Bi Kurdî di navên rehekan da zayenda nêrtî û mêtî bi hawayekî eşkere, çend cûre rehek hatin destnîşankirin. Li devera Pali'yê cûreyên *Scorzona* “şinga may” û “şinga nêr”, li Bongilan cûreyên *Urtica* ‘yê “yexîja may” û “yexîja nêr”, li Bazîdê cûreyên *Elaeagnus*’ê “sinca mê” û “sinca nêr”, li Madenê *Papaver rhoeas*’ê bi navê “vilika nêrimakî”, li Deşta Herranê cûreyekî *Arum*’ê bi navê “karîya nêr” tê navkirin.

Di Kurdî de ji hinek navên rehekan bi navên organên zayendî tén binavkirin: kîrbocî, kîrkê ereban, kîrikê kero, kîrgilok, kîrqazî, nêrimok, quzgezîk, quzqelew, vilika nêrimakî û zilika ereban nimûne ne.

Binavkirina Daran De bi Hevminana Zimanê Firansîzî û Zazakî

Bi Zazakî navên daran

navê meywe + er / ere / êre = navên daran

arxîçêre, bowrincêre, buxrêre, çinanêre / çinayêre, çilegêre, gozêre, henalêwre, incilêwre, kinayêre, mazêra pelvilayêre, payizêre, çilçêre, qijikêre, sayêre, sêzêre, şilanekêre, teyêre, valêre / vilayêre / vîyalêre, vindêre, vizêre, xibêre, xirtikêre, xizumêre, zungulêre, azgilêre, baluyêre, mazêre, şablêre / şavlêre, luxpêre / xulpêre, mazêra pelvilayêre.

Formên din :

asindar, gendar / sûrdar, guldar, koçikdar, wişkdar

dara awreşî, dara duzik, dara selwîye, dara tuzbeyan

dargez, dartizbî

Bi Fransizî navên daran

Meyve(Tr.)	Meyve(Fr.)	Meyve Ağacı(Fr.)	Meyve (Za.)	Meyve Ağacı(Za.)
elma	pomme	le pommier	say	sayêre
armut	poire	le poirier -	murî	murîyêre
kiraz	cerise	le cerisier	gilyaz	gilyazêre
limon	citron	le citronnier	leymun	leymunêre
erik	prune	le prunier	alûnç	alûnçêre
zeytin	olive	l'olivier	zeytun	zeytunêre
portakal	orange	l'oranger	porteqal	porteqalêre
meyve	fruit	fruitier	meywe	meyweyêre

Navdanî di cureyên rehekên kovîda

-ek	cewek, sayek
-ic	vamic
-ik	ajik
-î	gizêrî
-vaş	cewvaş, korekvaş, şilêlvaş, xelevaş
tir-	tirîşêre, tîrgewen / tirtir
bejik / bejî	hêjîra bejik, kevza bejî, neha bejî, puneyo bejik
beyar / beyare	beyare, beybûna beyaran, keta beyare, mêwa beyar
bêyaban	cehterê hêyaban, xurtmeya hêyaban
beyanî	çaya beyanî / çeya beyanî
bisra	tuya bisra
bince/pînc/pînce	guno pînc, qewaxa bince, vîyalêra pînce
bor / borî	dehlborî, fîndîqa borî, valbor/valêra borî, sayêra borî, teya borî
dehl	bîbera dehlî, daralînkî dehlî, helûtîrîşîka dehlê, bîyoka dehlê
derewîn	cehê derewîn, eruga derewîn, gula derewîn, kerbeşa derewîn, mêwa derewîn, zefranî derewîn
deymî	bêşkeşîre deymî, danewêley deymî, gizerge deymî, gulhelawe deymî, hengûre deymî, kuleke deymî
gêwîle	catire gêwîle, rêhane gêwîle, sipone gêwîle
kelemî	kenêra kelemî
kerk	guhkerk, hêjîrkerk, kuncikerk, peykerk
kêfî / kêfîle	bilalûkê kêfîle, morzey kêfî, mêxekî kêfî, nokkekêfîle
kêwî	bademkêwî, hêncîrkêwî,
kêwîle	bozane kêwîle, catire kêwîle, hermê kêwîle, hêzo kêwîle, merze kêwîle, rêhane kêwîle, xezîme kêwîle
kovî / koyî / kûvî	bînefîşa kûvî, çeya koyî, kerefsa kûvî, menewîşa koyî, rihana kovî, sîro koyî, vama koyî, vîla koyî
kaskên / qestîkên	bêzo kaskên, gula kaskên, kubazîka kaskên, sîrkuçanê kaskên, xoşîla qestîkên,
xirş	kezwana xirş / qizwana xirş

zura/zuray/zurayên gewenzura, gula zuray, kerkûrzura, mîsmîseka zurayên, qamqêra zura,
qewaxa zura, tuya zura, xoxa zura

Di cûreyên kulturî da navdanîn

rezi anixo rezi, bîya rezi, kenêra rezi, qewaxa rezi,
saya rezi, teya rezi, valêra rezi, zeytuna rezi

Di Kurdî da navên rehekên mijok

Cuscuta herhilênêk, riyezil, rizik, vaşo bêkok, zerzerok
Orobanch vergvaş, vila bêkoke, xamxamoke, zipling
Viscum album bawkone, dakone, vaşo bêkok, xodare

Di navên rehekan da ferqa devokan

Di zimanê Kurdî yê rojane da guherînên devokî di navên rehekan da jî heye. Li jêr navên cûda ku jî bo hirmî yê jî heman rehê tên gotin hatine listekirin.

Mînak: hemro, hemrû, herçî, hermê, hermo, hermû, hirmê, hirmik, hirmî, hirmo, hurmê, hurmî, karçik, karçiv, kirosik, kirotik, meroe, meroy, miro, miroy, miroye, mirwa, mirwi, mirya, mura, muriye, muri, muriye, muroy, mûra, mûrû, murvî, qarçin

Di Gotinên Pêşyan, Bivêjan û Çivanokên Kurdî da Navên Rehekan

Bi Kurdî bivêj û gotinên pêşyan

Ava goşt û balcana, ne xwar ne da cîrana.
Ava ser berûyan, wek zavayê dilê xesûyan.
Avîlok zi nexşê xwedê ye.
Axbandirê ziri zire, ji gošta berxan xweştir e.
Balcan goştê xizanan e,
Baxçê gula, para beaqila.
Belûye, puşê xo mîyan de bena girde.
Bero ji ceftê da ket, go dev î çere ye !
Berû ji darê ketî, dar nasnekirî.
Berû bi qalikê xwe dikenî.
Berû da bizinê û dest avête qemçikê.
Berû ji kovikê derket got "ez ji te nînim".
Bi dilê keran bîmine, qevdek baxdenûs namine.
Bi eşqa mêwîja, dil diçe guvîja.
Bi qasê goze biyayîş la gozerê ra qisey kerdiş.
Bi seriyek sîr nekirin.
Bi şev şemamok bi roj pîrebok bûyin.
Bitîm bi şaxên darên benan ve digîjin.
Bizrê pîrparê bûyin.
Bîyo kengerê verê vayî.
Bo xatirê gulê, dirik dikeve paşilê.
Bûne sîwaka şêx û axa.

Bûyin dirika reş.
 Bûyin îsot.
 Çelleyê erebî û firîgên nokan?!.
 Çil kilamen hirçî ne, hemû jî li ser dara hermî ne.
 Dar bi berê xwe şîn e.
 Dar û devî bi guh in!
 Dar ku ket, herkes bivirê xwe lê dicerîbîne.
 Dara hirmîyan sêvan nade!
 Di zebeşî bi yow dest a weranêdîyenê.
 Di zebeşî bi yew dest a nêgirîyenê.
 Dibê qey sêvek e, kirine du felq.
 Dimirim dibiecim; ceh dibêje ez birinc im.
 Donê genê nabit rûn, qereçî nabit xatûn.
 Ez dimirim û dibiecim ku ce jî dibêje ez birinc im.
 Ê dizane dizane; ê nizane baqê nîskan e.
 Garis ji dest dernakeve.
 Garis ji destan nerîjîn.
 Gayê fiso, nan garis ol.
 Genim ko sorî da, das jî biha dibe.
 Giya di bin kevir de namîne.
 Giya li bin keviran nemîne.
 Giyayê hewşê, ji xwedîyan re tehl e.
 Giyayê hewşê, ji xwedîyê malê re tehl e.
 Cula geş dane ber pozê kerê reş.
 Gul bê bîhn nabe.
 Gul bû, baran lê ket şil bû.
 Gul li gulê dinihêre dipeqe.
 Guzê xwe dijmêre, lê sêvên xelkê najmêre.
 Heft çîrokê hirçê ne, her heft jî li ser hermê ne.
 Heftê û heft çîrokên hirçê hene, hemû jî li ser dara hirmê ne.
 Heke xiyar e, ji tutikê ve diyar e.
 Heliz di dema xwe de maqûl e.
 Henî yo, zê dendikê şîrî yo.
 Herçî ber e, gula zer e.
 Herdîşê xas, qinê pîyaz bîyayîş.
 Her giya li ser koka xwe şîn dibe.
 Her giya koka xwe ser şîn dibe.
 Her giya li ser koka xwe şîn tê.
 Hermî hermîye ve, sêv sêvê ve dikele.
 Heya hêrî, bigre xernûf.
 Heziran hizirî, giya li baskê kizirî.
 Hênî pûne ra aciz o, pûne zî şino çîmeyê hênî de beno zergûn.
 Ji kerengê pirsîn gotin, cihê te li kû ye ? Got ba dizane.
 Ji sorik patile çênabe.
 Ji şîlanê nîr çênabe.
 Kakilê gûzê bûyin.

Kefa şîna ku bi ser avê dikeve, bêhêvî dest davêjîn kefsê kevzê.
 Kelemê nav çavê tirk û ereb û îranî tu.
 Ker ji nefelê fahm nake.
 Kerê re gotin em te bibin cenetê, got: ma givzonîk li wê hene ?
 Kero nemir, haya ku çîvar çê be.
 Kes pîvazan pê hur nake.
 Kêyna şargê gulana, waştîya vîst û hewt tenan a.
 Korek dest ra nêrişyayîş.
 Kirin wek pincar.
 Kudirê mîranî, çêtir e ji şekirê şîranî.
 Kurmê darê ne ji darê be, dar narîze.
 Letîfa şeng û nazîk wek belazîz.
 Li kundir xistin.
 Li ser dirikan runiştin.
 Lo, veng mevecêre, malkî xulokû benê.
 Lo, şîma qeşî kerd, malkan xuloke berde.
 Lomeya pîvaz ji sîr kirin.
 Maneya nedayînê, "weris li garis e."
 Mar ji pûngê aciz e, pûng ji diçe li ber qula wî hêşîn tê.
 Mesela sîr û pîvaz kerdiş.
 Min sîr nexwariye ku bihn ji devê min bê.
 Mîze verdeno teli, keno wişk.
 Nanê gilgil ji tunebûnê çêtir e.
 Nav giya de tolikê begemkirin.
 Ne kortigê kerengan bûyin.
 Ne pîrê baş kir li ser gwînî rûnişt, ne gwînî baş kir li pîrê re çû.
 Ne pîvaz werdiş, ne fek vêşayîş.
 Nebatek awk nêmendîş.
 Neheyê serê tahte bîyayîş.
 Nisk kirin gîsk.
 Niskê dike gîsk.
 Nok ji dibêje pozê min heyê!
 Nok tê li koke.
 Pelê kelmayêre bîyayîş.
 Periya bîyî dar (Da ko Apolo rizgar bibit).
 Pctêxên zer para kusiyan e!
 Pincara çiyayeki bûyin.
 Pisîngeke mar werd, dime ra şîna guriz wena.
 Pîr bi pîvongê carek tê xapandîn.
 Pîvaz pîvaz e, çi sor e çi sipî ye.
 Pîvaza nexwe, bila bîn jî te nçyê.
 Pîvaz pîvaz e, çi sor e çi sipî ye.
 Qîz sêva li darê ye, her kes çoye xwe davêje.
 Rojek a gule ye, yek a gulşîlanê ye.
 Seriyek pîvaz, bîhne berdîde beroşeke.
 Sey dirrik dûsiyeno çew a.

Sey dirrike, kê ya dustîyayîş.
 Sey girê darî bîyayîş.
 Sey parpar zêdîyen î.
 Sey parparî, zêdîyayîş.
 Sey pirparî zêdiyayîş.
 Sîr jî ji pîvaz re dibêje “wêde here, bîhn ji te tê!”
 Sîr û pîvaz ra qisey kerdiş.
 Te can ê, ê me balcan e? / te can ê, ê min balcan e?
 Temuz e, kakil kete gûz e.
 Tene bûn firig, mele bûn şîrig.
 Tey herîgop vecîyayo.
 Ti vana porê xo bîyo palaxe.
 Ti vana silqo sûr o / Bîyo silqo sûr.
 To vile dîy, tira darû çîy.
 To beng werdo!
 Tovê pirparê bûyin.
 Tûzik li ser ava ye.
 Vaşê hewşî wayîrê keyeyî re tahl o.
 Weke zilindar tahl e.
 Wek liba nîskê ye; ne ber e ne pişt e.
 Ya turek mêwij, ya kelemekî tuj.
 Zarok kulîlka malan e.
 Zarê şîrîn, pîvaza tuj dike hinguvîn.
 Zebeç neçûyin dev.
 Zê gulike tarmelê bî şî.
 Zîrê korekî vîyartîş.
 Zor gizêre radike.

Çivanokên Kurdi

Mi gul eşt vêr herî,
 Hêr va ez gul sekerî,
 Zirra semêd kengerî.

Qedra gula çî zanîn,
 Kerbeş divê kerê reş.

Çî zanit qedra gulê,
 Kerbeş divêt kerê reş.

Nêriyo mayo çî ca za,
 Hewşê babê mî de za.

Endilko, bavê beko,
 Tekê min o tekê keko.

Ceh keran şamî dike,
 Mesqel şûran misrî dike,
 Xizanî mêran kotî dike.

Darê min kulavê min,
 Rehmet li dê û bavê min.

Demek a vilikan e,
Demek a sosinan e.

Deyî şarî gay û bizî,
Deyî mi gul û nêrgîzî.

Genimê dewsa kizinê,
Bexê li ber bizinê,
Mêrê bindestê jinê,
Her sê hesabê mirinê.

Germ germa tûyan e,
Kêf kêfa rutan e.

Ha namus,
Ha baxdenûs!

Kero nemire bihare,
Heta çêbin qîvare.

Pîrê nemir bihar tê,
Kero nemir qîvar tê.

Li ku dare,
Li vir ware.

Mala bavan gula geş,
Mala mêran roja reş.

Mi eşt gozêre,
Şi gîna mazêre.

Mi eşt sayêre,
Şi ame tuyêre.

Av heye,
Nan heye,
Pîvaz heye,
Lo lo tu çîma dimirî ?

Nan nanê genimî,
Bext bextê mêran.

Ne belçim man,
Ne sorgul man,
Ne rihan man,
Ne simbil man.

Ne dixwim gêlazan,
Ne didim hevrazan.

Ne sosin man ne alal man,

Ne alalê siyahxal man,
Tenê min heyf li wan xware.

Nêrgîz, nêrgîz, nêrgîzvanê,
Dewkilê bêriwanê.
Sêva çê,
Para hirçê.

Şemo birayî Mamî,
Gozan bedelîno bi vamî.

Şohreta çeman dar û bî,
Şohreta qîz û bûkan, şar û temezi.

Tamî, tamî,
Gula şamî,
Goştê gur heram î.

Tebax e,
Tirî bax e.

Tura mina tadaye,
Binê herdî de radaye.

Xele bi firîk,
Mela bi şîrîk.

Xwediyê xiyarê çilmisî,
Ne dixwe, ne dide kesî.

Zebeş e,
Dendikreş e,
Xwarinay xweş e.

Zebeş bi dengê xwe,
Hinar bi rengê xwe.

Zebeş ji xwarinê re,
Dendik ji daninê re.

Encam

Di vê xebatê da navên cinas û cureyên rehêkan ji nav xelkê û ferhengên kurdî de hatiye berhevkirin. Ev navana hatine indekskirin, li hemberî wan, navên tirkî û latînî hatine çîhkirin. Binavkirina kurdî yê rehêkan de rêbazên giştî û herêmi hatine tesbîtkirin, cûdayetî ji hatine nîşankirin û berhem pêşkêşî zanistê botanîkê yê dinya yê bûye.

ÇAVKANİ

- Akan, Prof. Dr. Hasan. *Şanhurfa'nın Nadide Çiçekleri*. Şanhurfa: Şanhurfa Belediyesi, 2005.
- Akan, Prof. Dr. Hasan. *Tabiat Varlıklarıyla Urfa*. İstanbul: Şanhurfa Valiliği, 2008.
- Altınayar, Gürol. *Su Yabancı Otları*. Ankara: DSİ Genel Müdürlüğü, 1988.
- Bamernî, Sedullah Hüsên. *Giya û Derman. Şebab, Hewlêr*. Matbabatus Seqafwêş, 1985.
- Baytop, Prof. Dr. Asuman. *Bitkilerin Bilimsel Adlarındaki Niteleyiciler ve Anlamları*. İstanbul: E.U Ecz. Fak. Yayınları, 1995.
- Baytop, Prof. Dr. Asuman. *Türkiye'de Botanik Tarihi Araştırmaları*. Ankara: Tübitak, 2004.
- Baytop, Prof. Dr. Turhan. *Türkçe Bitki Adları Sözlüğü*. Ankara: Türk Dil Kurumu, 1997.
- Bedirxan, Celadet Ali. *Ferhengê Kurmancî-Frensî*, "Kovara Vate". Sayı: 1-18. Stockholm: Vate, 1997-2002.
- Bedirxan, Celadet Ali. *Ferhengê Kurdî – Kurdî*. İstanbul: Avesta, 2009.
- Botî, Kamêran Silêman. *Ferhengê Kamêranê Kurdî-Kurdî*. Dihok: Spirêz, 2006.
- Bozaslan, M.Emin. *Ferhengê Kurdî*. Cildê Pêşin A-D. Dîyarbekir: Deng, 2008.
- Davis, P.H., *Flora of Turkey and the East Aegean Island*. Vol.11. Edinburgh: University of Edinburgh, 1965-1988.
- Ceylan, Gürkan. *Güller, Karanfiller, Laleler ve Sümbüller*. İstanbul: Flora, 1999.
- Demirhan, Umîd. *Ferhengê Destî Kurdî bi Kurdî*. İstanbul: Akademî, 2007.
- Ebcioğlu, Nejat. *Bitki Adları Sözlüğü, Türkçe-İngilizce/İngilizce-Türkçe*. İstanbul: İnkılap, 2009.
- Ekim, Tuna. *Türkiye'nin Nadir Endemikleri*. İstanbul: İş Bankası Kültür Yayınları, 2009.
- Rmîni, Emîr. *Illustrated Dictionary of Therapeutic Plants and Their Traditional Usage in Kurdistan, Kurdish-English-Persian-Arabic-Turkish*. Senendec: Aramî Gester, 1968.
- Erdem, Turan. *Ferhengê Zazakî-Tirkî / Tirkî Zazakî*. İstanbul: Doz, 1997.
- Erwasi, Şêx Mihemed. *Tîba Melayê Erwasi*. Stenbol: Enstituya Artuklu, 2013.
- Farqîni, Zana. *Ferhengê Kurdî-Tirkî*. İstanbul: Enstituya Kurdi ya Stenbole, 2004.
- Farqîni, Zana. *Türkçe-Kürtçe Sözlük*. İstanbul: İstanbul Kürt Enstitüsü, 2000.
- Gazî, Mustafa. *Ferhengê Kurdî-Tirkî*. Amcd: Enstituya Kurdi ya Amedê, 2006.
- Gewranî Elî, Elî Seydo. *Ferhengê Kurdî Nûjen*. Emman, 1985.
- Gruba Xebate ya Vateyi. *Ferhengê Kirdkî – Tirkî*. İstanbul: Vate, 2009.
- Gucst, Evan. *Flora of Iraq*. Cild: 1,2,3,4,5,8,9. Baghdad: Ministry of Agriculture, Republic of Iraq, 1966.
- Hayig R. Werner B. *Zazaca - Türkçe Türkçe – Zazaca Sözcük Listesi*. İstanbul: Tij, 2012.
- Hekkarî, Xalidê. *Zerzewatên Şîfadar*. İstanbul: Nûbihar, 2012.
- Izoli, D. *Ferhengê Kurdî – Tirkî, Tirkî – Kurdî*. İstanbul: Deng, 1992.
- Kasimoğlu, Ahmet. "Bitkilerin Zazaca Adlandırılması". Ankara: Bingöl Üniversitesi, Uluslararası Zaza Dili Sempozyumu, 2011. s. 247-262.
- Kocadağ, Çeko. *Ferhengê Kirmanckî – Kurmancî, Kurmanckî – Kirmanckî*. Berlin: Komkar, 2010.
- Rojnameya Taybetî ya Enstituya Kurdi ya Parisê. *Kurmancî*. Hejmar 1-50. İstanbul: Avesta, 2012.
- Kurdistanî, Elî Ekber. *Ferhengê Kurdîstanî*. İstanbul: Nûbihar, 2010.
- Malmisanij. *Zazaca-Turkce Sozluk/Ferhengê Dimilki-Tirkî*. İstanbul: Deng, 1992.
- Mat, Prof. Dr. Afîfe. *Türkiye'de Zehirli Mantarlar*. İstanbul: Nobel, 2000.
- Mukrîyanî, Gîwî. *Ferhengê Kurdistanê Kurdî – Kurdî*. Dîyarbekir: Enstituya Kurdi ya Amedê, 2010.
- Namukoğlu, Necatî Güneş. *Türkiye'nin Ağaçları ve Çalıları*. İstanbul: NTV Yayınları, 2008.
- Orçun, Ercüment, Sera ve Salon Süs Bitkileri, Cilt I, Ege Üniversitesi, İzmir, 1967
- Özcan, Mesut. *Zazaca-Türkçe Sözlük*. İstanbul: Kaynak, 1997.
- Özhatay, Prof. Dr. Neriman. *Türkiye'nin 122 Önemli Bitki Alanı*. İstanbul: WWF Türkiye, 2005.
- Polat, Edip. *Bilim Dilinde Kürtler*. İstanbul: Evrensel, 2004.
- Prof. Farizov. *Türkçe / Kürtçe Sözlük*. Ankara: Özge, 1994.
- Qazzaz, Şafiq. *Kurdish-English Dictionary*, Aras, Erbil, 2000
- Saadalla, Salah. *Saladin's English-Kurdish Dictionary*. İstanbul: Avesta, 2000.
- Saya, Prof. Dr. Ömer. *GAP Yöresindeki Endemik ve Tıbbi Bitkiler*. Ankara: Türkiye Çevre Vakfı, 2001.
- Seçmen, Prof. Dr. Özcan. *Tohumlu Bitkiler Sistematiği*. İzmir: Ege Üniversitesi, 1992.
- Serin, Prof. Dr. Yunus. *Türkiye'nin Çayır ve Mera Bitkileri*. Ankara: Tarım ve Köy İşleri Bakanlığı, 2008.
- Söylemez, Kamer. *Zarzewat û Yemîş Naskena?*. İstanbul: Gayret Matbaacılık, 2010.
- Tazegül, Emrullah. *Dictionary of Agricultural Sciences*. Volume I-II. İzmir: 1987.
- Torlak, Hasan. *Türkiye'nin Endemik Bitkileri*. Ankara: Kültür ve Turizm Bakanlığı, 2010.
- Turgut, Harun. *Zazaca-Türkçe Sözlük*. İstanbul: Tij, 2001.
- Turgut, Harun. *Türkçe – Zazaca Sözlük*. İstanbul: Doz, 2008.
- Tuzlacı, Prof. Dr. Ertan. *Türkiye Bitkileri Sözlüğü Türkçe-Latince/Latince-Türkçe*. İstanbul: Alfa, 2006.
- Vate Çalışma Grubu. *Türkçe Zazaca Sözlük*. İstanbul: Vate, 2011.
- Vate Çalışma Grubu. *Zazaca Türkçe Sözlük*. İstanbul: Vate, 2009.
- Wahbî, Taufiq & Edmonds, F. J. A. *Kurdish - English Dictionary*. London: Oxford, 1966.
- Xidirî, Seyid Şihab. *A Dictionary of Kurdistan Medicinal Plants*. Senendec: Danışgehî Kurdistan, 1961.
- Yakar, Prof. Dr. Nebahat. *Renkli Türkiye Bitkileri Atlası*. İstanbul: Büke, 2004.

ÖNSÖZ

Tarih boyunca her toplum kendi dilinde bitki ve bitki gruplarını basit ve anlamlı adlarla adlandırmıştır. Bu adlandırmada, son derece doğal ve iptidai şekilde bitkinin görünümünü veya diğer özellikleri belirleyici olmaktadır.

Kürtler de bin yıllardır bitkileri, kendi dilleriyle adlandırarak günümüze kadar taşımışlardır. Ancak Kürtlerin yaşadığı şartlardan dolayı bu sözel adlandırma yeterli düzeyde yazılı hale getirilememiştir.

1999 yılında İstanbul Kürt Enstitüsü'nü telefonla aradığımda, bitkilerin Kürtçe adlandırılması konusunda bir çalışmanın bulunmadığını öğrenerek çalışmaya başladım.

Bu çalışmaya ivme kazandıran, rahmetli annem Hurme Kasımoğlu'nun Diyarbakır Şilbe Toplu Konutları park alanından toplayıp, fıstanının peşine doldurduğu otları baba evinde bana bir bir Zazaca adlandırarak, çalışmamı desteklemesi oldu. Sayın Celal Talabani'nin eşi Hiro Hanım'ın adının, Türkçe'deki hatmi çiçeğinin Kürtçe adı olduğunu, annemden öğrendim.

2003 yılında TZMOB Diyarbakır Şubesi'nde Bitkilerin Kürtçe Adlandırılmasını seminer halinde sundum. 2004 yılında Vate dergisinin 23. sayısında "Bitkilerin Zazaca Adlandırılması" başlıklı makaleyle, bitkileri yazılı olarak tanıtmaya başladım.

2006 yılında Paris Kürt Enstitüsü tarafından Duhok'ta yapılacak çalışmaya davet edildim. Davete seve seve katılarak, Kurmanci çalışma grubuna, Bitkilerin Zazaca Adlandırılması konulu çalışmamı Zazaca olarak sundum. Grubun beğenisini kazandım. 2007 Duhok, 2011 Van ve 2012 Doğu Bayezit'te yapılan Kurmanci grubu 38, 40, 48 ve 50. dönem çalıştaylarına katıldım. Bunlardan ilk 3 çalıştaydaki bitki adları çalışmaları, Kurmanci Dergisi'nde *Flora Kurdistanê I, II ve III* başlığıyla yayınlanmıştır.

2009 ve 2010 yıllarında Kurd 1 televizyonu için bitkileri Zazaca, Kurmanci, Türkçe ve Latince adlarıyla tanıtmaya yönelik çekim çalışmalarım sırasında; Siverek, Dicle, Hani, Eğil, Kulp, Bingöl Merkez ve Genç ilçelerindeki bazı bitkiler yerinde görüntülenerek, televizyondan tanıtılmıştır.

2011 Mart ayında yayına başlayan Zazaca gazete Newepel'in bugüne kadar yayınlanan 50 sayısının her birinde, bir bitki resmiyle birlikte Zazaca, Kurmanca, Soranca, Goranca, Latince ve Türkçe adlarıyla tanıtılmıştır.

Kürtçe yayınlarda Ehmedê Dirihî adımı kullanıyorum.

2011 yılında Bingöl Üniversitesi'nin düzenlediği Uluslararası Zaza Dili Sempozyumu'nda, Bitkilerin Zazaca Adlandırılması başlıklı makalemi sundum.

Kürtçe bitki adları derlemesinde bilinen en eski çalışma, botaniğin babası olarak da tanınan İran Kürtlerinden Ahmet Dinaveri'nin (828-896) *Bitkiler Kitabı (Kitabê Nebatan)* adlı eseridir. Bu kitapta, Arap botanik gelenekleri, bitki incelemeleri ve bilgisinin yanı sıra Farsça ve Kürtçe kökenli bitki bilgileri de vardır ve yıllarca botanik alanında standart kitap olarak yararlanılmıştır.

Kürtlerin yaşadığı şartlardan dolayı bu sözel adlandırma yeterli düzeyde yazılı hale getirilememiştir.

Seyid Şehab Xidirî 1961 de, "Kürdistan'da Tıbbi Bitkiler" hakkında Kürtçe - Farsça sözlüğü, Emir Emîni 1968 de, "Kürdistan'daki Tıbbi Bitkilerin Geleneksel Kullanımı" hakkında Kürtçe - İngilizce - Farsça - Arapça - Türkçe sözlüğü İran'da yayınlamışlardır. Her iki kitapta bitkilerin Latince adları Latin harflerle, Kürtçe adları Arap harfleriyle yazılmıştır. Bu Arap harfleriyle yazılı Kürtçe bitki adlarını, Ayhan Meretowar Latince harflere transkribe ederek tarafıma vermiştir. Kendisine teşekkür ediyorum.

Sadullah Husên Bamernî 1985'te, Bamernî yöresinde kullanılan tıbbi bitkileri tanıtan kitabını Erbil'de Kürtçe yayınlamıştır. Kitapta bitkilerin Kürtçe adları Latin harfleriyle, bitki ve kullanım hakkındaki bilgiler ise Arap harfleriyle yazılmıştır.

Flora of Iraq kitabı 9 cilt olup, 5. 6. ve 7. ciltleri yayınlanmamış olduğundan, diğer 6 cildi taradım. Kitabın dili İngilizce'dir ama bazı bitki adlarının Kürtçe adları da vardır ve bu adlar da İngilizce alfabeye yazılmıştır. Bunlardan Kürtçe adları tespit edilen bitki adları, İngilizce harflerle FI koduyla sözlüğe aktarılmıştır.

Irak, Suriye ve Türkiye'de yayınlanan Kürtçe-Kürtçe, Kürtçe - Fransızca, Kürtçe - İngilizce, İngilizce - Kürtçe, Türkçe - Kürtçe ve Kürtçe - Türkçe genel sözlüklerden, bitki adlarını tarayarak sözlüğüme ekledim.

Bu araştırmamda bana yardımcı olan başta Harran Ovası Kürtleri olmak üzere, Abdullah Güneş, Azad Demir, Eyüp Kıran, Hamit Kılıçaslan, Hamit Yıldırım, Hatip Özer, İskan Teğin, Keya Müstak, Medeni Akgül, Medeni Avcı, Mehmet Emin Kardeş, Mehmet Özdemir, Mehmet Sarısaltık, Mehmet Sıraç Bilgin, Mehmet Sıraç Yeşil, Mehmet Teker, Mert Nedim Alhas, Metin Dinar, Müslüm Ölmez, Sadettin Aydın, Sait Aydoğmuş, Servet Yazar, Sıtkı Zilan, Şaban Bilgin ile eşim Bedriye Semra ve annesi Koçer Savaş, oğlum Serok, kızların Evin, Dijle, Delal, Şirin ve Dilber'e ve katkısı bulunan herkese desteklerinden dolayı, teşekkür ediyorum.

Deniz Gündüz, Eyüp Kıran, Mehmed Malmisanij, Reşo Zilan, Roşan Lezgin ile W.K.Merdimin Zazaca ve Kurmanci diyalektlerindeki yazılıma, dilbilimsel katkıda bulundular. Teşekkür ediyorum.

Zazaca bitki adları hakkında rahmetli Necmettin Büyükkaya, Nafiz Yılmaz ve Siyamend Mirvani'nin yazılı derlemeleri ile Doğan Munzuroğlu'nun, internet sayfasındaki derlemelerinden yararlandım. Necmettin Büyükkaya Siverek, Nafiz Yılmaz Eğil, Siyamend Mirvani Arıcak ve Doğan Munzuroğlu Ovacık yöresindeki bitki adlarını derlemişlerdir.

Günümüze kadar yayınlanmış genel Kürtçe sözlük, kitap, dergi ve diğer yayınları tarayarak, ayrıca Kürtçe'nin konuşulduğu coğrafyada Doğu'da Iğdır, Doğu Bayezid, Van ve Hakkari'den, Batı'da Zaza'nın Zazalar Mezrası, Kuzey'de Tercan ve Karayazı'dan Güney'de Barzan, Amediye, Duhok, Mardin, Urfa, Adıyaman ve hatta Maraş'a kadar bitkiler yerinde görülerek, adları derlenmeye çalışılmıştır. Maraşlı Kürtler başlangıçta bildikleri bitki adlarını söylemeye başladılar da, Kürtçe alfabeyle yazdığını görünce yardım etmekten vazgeçtiler.

Bu çalışmada Kürtçe konuşulan yörelerden Adıyaman'ın Merkez ve Kahta; Ağrı'nın Doğu Bayezid; Batman'ın Kozluk; Bingöl'ün Merkez, Adaklı, Genç, Karlıova ve Solhan; Bitlis'in Mutki; Diyarbakır'ın Merkez, Çermik, Çınar, Çüngüş, Dicle, Eğil, Hani, Kulp, Lice ve Silvan; Elazığ'ın Arıcak, Gulaman, Maden, Palu ve Sivrice; Erzincan'ın Tercan; Mardin'in Nusaybin, Kızıltepe ve Merkez; Muş'un Varto; Hakkari'nin Merkez; Iğdır'ın Merkez; Sivas'ın Kangal ve Zaza; Şanlıurfa'nın Merkez ve Suruç; Tunceli'nin Merkez, Nazımiye, Ovacık ve Pülümür; Van'ın Merkez ilçelerine gidilerek bitki adları derlenmiştir.

Türkçe Bitki Adları Sözlüğü, Türkiye Bitkileri Sözlüğü, GAP Yöresindeki Endemik ve Tıbbi Bitkiler, Şanlıurfa'nın Nadide Çiçekleri, Tabiat Varlıklarıyla Şanlıurfa ve Türkiye Bitkileri Listesi ki-

taplarındaki Kürtçe bitki adları da tespit edilerek, Kürtçe alfabeyle karşılıkları bulunarak uyarlanıp derlenmiştir.

Bu sözlükte, Kürtçede birden fazla biçimleri olan sözcüklerin tespit edilebilen tüm biçimleri sunulmuştur. Kürtçe sözcüklerden sonra yazılan kısaltmalarla sözcüğün cinsiyeti hakkında bilgi verilmiştir. Örneğin gula sor (m), teliyê beloq (n) v.b.g.

Cinsiyeti belirten kısaltmadan sonra, biliniyorsa sözcüğün alındığı kaynak, kişi veya yer kodlanmıştır. Bu kodların açılımı, sözlükler ve kişiler, ya da şehirler ve yöre adları, kitaba ekli listede açıklanmıştır. Örneğin IS (İstanbul Kürt Enstitüsü), CB (Celadet Bedirxan), SHB (Sadulah Husên Bamernî), Dîyar (Diyarbakır), Palî (Palu), Sîwan (Sivan) vb.

Bilgi edinmek için, yapılan araştırma gezilerinde, aşağıdaki yöntem uygulanmıştır:

a. Önceden Kürtçe yazılı kaynaklar taranarak gidilecek bölgede kullanılan bitki adlarının bir listesi hazırlanmış ve gezide bitkiler bu listedeki adlara göre aranmıştır.

b. Araştırma gezileri sırasında, bitkilerin Kürtçe adlarının büyük bir bölümü, yöre halkından öğrenilmiştir. Bu kişilerin bitkiler hakkındaki bilgileri sınırlı olup, verdikleri adlar başka kaynaklardan doğrulanmaya çalışılmıştır.

c. Kürtçe adı öğrenilen bitkilerin örnekleri alınıp, Latince ve Türkçe adlarının da tayini için Dicle Üniversitesi'nden Prof. Dr. Selçuk Ertekin ve Prof. Dr. Ömer Saya'ya başvurularak öğrenilmeye çalışılmıştır. Mantar adlarının tayininde ise Prof. Dr. Abdunnasır Yıldız'dan destek alınmıştır. Dicle Üniversitesi'nden Prof. Abuzer Sağır çalışmamın başlangıcında, Harran Üniversitesi'nden Prof. Hasan Kaya sözlüğün yayınlanmaya hazırlanması sürecinde öneri ve uyarılarıyla katkıda bulundular. Teşekkür ediyorum.

d. Kürtçe ve Türkçe bitki adlarının Latince bilimsel karşılıkları, *Flora of Turkey*, *Flora of Iraq* ve yeni yayınlanan *Türkiye Bitkileri Listesi* kitaplarında kabul edilen Türkçe ve Latince adlara uyularak verilmiştir.

e. Bitkilerin Kürtçe takson adları, özel adla tanımlanmış olsa da, küçük harfle başlayarak yazılır. Örneğin; adirvila koyê bingolî, qewaxa firatî, vila anafatma.

f. Kürtçe'nin konuşulduğu yerlerde yetişen bitki adlarına, bu yörelerde pazarlanan bitki adları da eklenmiştir.

g. Bitki Adları Sözlüğü ekinde fotoğraf bulunmamaktadır. Okuyucu isterse, bitkinin Latince adıyla arama motoru Google'ın sitesinden, istediği bitkinin yüzlerce resmini görebilir.

Bitkilerin Zazaca adları, Vate Çalışma Grubu'nun çalışmaları; Kurmanca adları ise Kurmancî Grubunun çalışmaları baz alınarak derlenmiştir.

İnternet yayınlarından, bitki adlarının Türkçe'den Latince'ye, Latince'den Türkçe'ye çevirilerinin temini için ya da bitkilerin görüntüleri de arama motoru Google sitesinden taranarak kayıt altına alınması için yararlanılmıştır.

Bitkilerin Adlandırılması

Bitki ve bitki gruplarına basit ve tek anlamlı bilimsel adlar vermek ve kurallar oluşturmaktır.

Bitkilerin latince adlandırılması

Bitkilerin bilimsel adları ya latince ya da diğer dillerden, özellikle Yunanca'dan Latinceleştirilmiş kelimelerden oluşmuştur. Bitki türlerinin iki latince kelimedenden yapılmış bir tertip ile adlandırılmasına ikili, "Binominal" adlandırma denir.

Binominal ad kullanımı örnekleri

Morus / dut / tu

Morus alba / beyaz dut / tuya sipi

Morus nigra / karadut / tuya siya

Morus rubra / mor dut / tuya ximri

Latince adlarda Kürtlerle ilgili kullanımlar

Latince bilimsel adın Kürtlerle ilgili olduğu hallerde, Latince adın Kürtçe karşılığı da, Kürtçe bitki adları arasına alınmıştır.

carduchorum

Kürt'lerin

kurdicus, a, um

Kürt

kurdiciforme

Kürt formu

kurdistanicus, a, um

Kürdistan

